

Çawa hûn dikarin li bernameya ESF-BAMF da beşdarî bikin?

- Ger wek bêkar an li kar geryan hatine tomar kirin, gel kar peydakerê xwe di ajansa kar, navenda kar an navenda peyda kirina kar di herême da pêwendiyê bigirin. Ew dikare were pêşniyar bike ku di polên zimanê Elmanî bi rêya forma qeydê (ESF-BAMF) tomar bikin û dibistana zimanê ku hûn dikarin di nav da kursê derbas bikin ji were pêşniyar bike.
- Wekî penaberên şer an koçber pê destûrê têketina nava bazara şolê bi rêya bernameya neteweyî „ESF-Integrationsrichtlinie Bund“ (ESF- Şireta Neteweyî ya entegrasyona çandî) di bernameya ESF-BAMF da tomar bikin.

Gava bê çi ye?

- Di dibistana zimanê we da destpêkê lazimiyên perwerdeyî te, pisporiyên we û rewşa zimanê we tê lêkolîn kirin. Encam nîşan diden ku çi çîna herî baş ji bo we û ka heta kengê divê bidome.
- Pêşveçûna we dê di dema kursê da bê berçav girtin. dibistanên ziman di dawiyê de zelal dike ka hûn çiqas gehîştine armancên xwe.
- Mamosteyê we tê bi rêk pêşketina perwerdeyê we di nivîskî tomar bike û di dawiyê de jî bi we re tê binirxîne.
- Di dawiyê da tê ji were belgeyeka beşdarbûna di kursê da bê dayin ku di nav da hem armancên perwerdehiyê û hem jî naverrok û pêşveçûna perwerdehiyê bi naverrok hatîye tomar kirin. Ev belgeya beşdarîya di kursê da alîkarîya te dike di berdewam kirina rêka şola we.

Xercê beşdarbûna di kursa zimanê Elmanî çiqas e?

Beşdarbûna di kursa zimanê Elmanî ji were belaş e.

Bûhayê hatin û çûnê, eger ku çiyê jîna we li sê kilometre ya zêdetir ji pola we dûr be, (peya rêka herî kin) tê ji were bê dayîn.

Agahiyên din li ku werbigirim?

Heke hun agahî bêtir dixwazin ji kerema xwe gel

Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
(Rêveberîya Koçberiyê û Penaberan a Koma)
Referat ESF-berufsbezogene Sprachförderung,
ESF-Verwaltungsstelle
Poller Kirchweg 101
51105 Köln

Telefon ESF-BAMF:

Telefon: +49 (0)221 92426-400
E-Mail: esf-verwaltung@bamf.bund.de

Bêtir agahîya li ser internetê li navnîşana jêr berdestin:
www.bamf.de/esf

Agahiyên belavkirinê

Belavker:
Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
Referat Steuerung der Projektarbeit, Integration durch Sport,
Informationsmanagement
Frankenstraße 210
90461 Nürnberg

Jêder:
Publikationsstelle des
Bundesamtes für Migration und Flüchtlinge
www.bamf.de/publikationen

Roja belavkirinê: 07/2015

Çap: Silber Druck oHG, Niestetal

Dizayn: KonzeptQuartier® GmbH, Fürth

Wêne / Mafê belavkirina wêneyan: Andres Rodriguez, Marion Vogel

Civata Nivîskari:
Bundesamt für Migration und Flüchtlinge
Referat Fragen der beruflichen Integration,
berufsbezogene Sprachförderung, ESF-Verwaltungsstelle



Li vir gel me hevdi tinê bikin
www.facebook.com/bamf.socialmedia

www.bamf.de



Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

Perwerdehiya Zimanê Elmanî bo Şolê

(Bernameya ESF-BAMF)



KURDISCH 07/2015 Berufsbezogene Deutschförderung





Perwerdehiya Zimanê Elmanî bo Şolê çi ye?

Perwerdehiya Zimanê Elmanî bo Şolê kurseke perwerdehiyê ye ji bo hemû kesên ku bi eslê xwe koçber in ku ji bo kar digerin.

Bernameya „Perwerdehiya Zimanê Şolê ji bo hemû kesên ku bi eslê xwe koçber in (programa ESF-BAMF)“ ji aliyê Wezaretê Netewî ya Karkeran û Xizmetên Civakî (BMAS) û Fona Civakî ya Ewropayê (ESF) tê destekkirin. Kurs ji aliyê Rêveberîya Neteweyî ya Koçberiyê û Penaberan (BAMF) bi rêve diçe.

Kursên ESF-BAMF di seranserê Elmanya da tên pêşkêşkirin. Ev kurs bi piranî ji babetên jêr pêk tên:

- Perwerdehiya Zimanê Elmanî bo Şolê
- Çinên Pisporî
- Hînkari
- Serdana cihê pişeyan

Her kursek herizêde pêk tê ji 730 demjimêrên perwerdehiyê û bi rewşa tam demî şeş mehan, û niv demî heta duwanzdeh mehan dirêj dibe.

Armanca Kursê Zimanê Elmanî yê Şolê çi ye?

Di dawiya kursê da dibe we şarezayiyên zimanî û pişeyî yê kêrhatî ji bo peyda kirina şolekê hebe.

Kî dikare beşdarî kursê bibî?

Bernameya ESF-BAMF ji bo hemû kesên ku bi eslê xwe koçber in hatiye li ber çavan girtin ku îmkana ketina nav bazara karî hene, û mûçeya bêkariyê yan mûçeya bêkariyê II distînin.

Penaber û avareyên şerî ji di rewşên taybet de dikarin li bernameya ESF-BAMF da beşdar bibin.

Dibe çi pêşpêdiviyên din hebin?

- **Diroka Koçê**
Eger bi kêmanî yek ji dê û bav, bapîr, an jî dapîra we ji bo Elmanya koçber bibe, tu eslê xwe koçberî. Di vê rewşê de, netewe ya we ne girînge.
- **Elmanî wek zimanê duyem**
Nabe Elmanî zimanê we y, dayîkê be.
- **Derbas kirina kursên întegrasyona çandî**
Dibe hûn kurseke pêvajoya întegrasyonê ya çandî ya Rêveberîya Neteweyî ya Koçberiyê û Penaberan derbas bikin û herî kêma asta zimanê A1 bidest bixin.

Di babetên îstisnayên jêr da bo beşdar bûn di bernameya ESF-BAMF da çi hewceyî bi beşdar bûna di bernameya entegrasyona çandî da tune ye:

- We zanyariyên hewce yê Elmanî hene (B1)
- We di bernameya netewî ya „ESF-Integrationsrichtlinie Bund“ (ESF- Şîreta Neteweyî ya entegrasyona çandî) da beşdarî kiriyê û asta Elmanî ya A1 heye

Hûn çi di vê kursê de hîn dibin?

Kursa Perwerdehiya Zimanê Elmanî bo Şolê

Di kursa perwerdehiya zimanê elmanî bo Şolê tam peyvan, rêziman û gotinan hîn dibin ku ji bo pêwendiyên kêrhatî gel heval, mişterî û rêveberên xwe pêdivîye.

Balkêşana kursên di liser zimanê nivîskî ye: Ji bo nimûne, hûn hîn dibin ku çawa bilez agahiyên rast ji nivîsan derxînin û an jî di nivîsandina name û emailên çî divê bi baldarî kirin. Kursê Elmanî piştgiriya kursên taybetî dike û gel vê hevrê ye lê di heman demê de ji Elmanîya bo şolên giştî jî hîn dike. Gelek ji zanînen xwe ya nû ji dikarin di jiyana xwe ya şexsî da bikaranîn.

Kursên pisporî

Di kursên pisporî, zanînen pişeyî yê pisporî bo nimûne, di biznisê de hîn dibin. Ji bilî vê, polên matematîk, karpeyda kirin û xebata pê kompûterê jî birêve diçe.

Pê serdana cihê bazirganî yê nêrînekî tam ji jiyana xwe ya şolî bidest binin û cîyê şola xwe ya pêşerojê nas bikin.

Rahênan

Di dema rahênanê da ji bo demeke destnîşankirî di cîyê biznisê de bixebitin û dikarin agahiyên xwe bi rewşa piraktîk bikar binin. Li gel vê, Bi rêya rahênanê dikarin nêrînek baştir ji jiyana xwe ya şolê di babeta pisporiya xwe da peyda biken.